

BÛRSÊN XWENDINA BILIND ÊN ENTÎTUYA KURDÎ

Daxwaznameya bûrsê divê, tevî belgeyên li jêr bi rêzkirî, herî dereng di 31ê tîrmehê da bigihîje Enstîtuyê :

- Nameyeke bi dest nivîsandî ku tê de xwendekar xwe dide nasîn û dibêje dixwaze çî bixweyne û ji bo çî
- Serborîya xwendekar (rewşa kar û xwendinê)
- Fotokopîya dîplomayên xwendekar tevî wergera wan a fransîzî an jî îngilîzî ya rastandî (tasdîkkirî)
- Fotokopîya nasnameyeke xwendekar (pasaport an jî belgeya rûniştinê)

ŞERTÊN BERENDAMETÎYÊ

Îmtîhan ji bo hemû keç û xortên Kurd ên ku bi kêmanî xwedî dîploma lîsê ne vekirîye. Berendam divê ji sazîyeke mîrî an jî taybetî ya din bûrs an jî alîkarîya xwendinê nestînin. Sînora emr ji bo ew kesên ku xwedî dîploma lîseyê ne 26, ji bo kesên xwedî lîsans û master jî 30 ye. Kesên ku hemwelatîyê yek ji welatên Yekîtiya Ewrûpayê bin, ji ber sedemên hiqûqî û îdarî nikarin bûrs bistînin.

KOMÎSYONA BÛRSAN

Daxwazname ji aliyê komîsyoneke heft kesî ku ji lêkolîner û profesorên kurd yê Iran, Irak, Tirkiye û Sûriyê pêk tê, tên tetqîq kirin.

Xwendekarên ku li Ewropayê dijîn û berendametiya wan hatiye pejirandin wê ji bo hevpeyvînê bên vexwendinê Parîsê di 16-17ê îlonê. Lîsteya xwendekarên ku mafê girtina bûrsê stendine wê di 18ê îlonê de bê dîyar kirin. Di mafdayîna bûrsan da wê pêşanî ji bo jinan, ji bo xwendekarên bi emr biçûktir, yê ku ji niha va xwedî dîplomayên zanîngehî ne û dixwazin doktora xwe bikin û yê ku baş kurdî dizanin bê dayîn.